
# Prensîpên Rêber li ser Jicîhûwarkirina Navxweyî

**(Guiding Principles on Internal Displacement – Kurmanji Kurdish Translation)**



UNITED NATIONS

The Guiding Principles on Internal Displacement have been translated into over 40 languages. The English language edition, published by the United Nations (E/CN.4/1998/53/Add.2), is the original language in which the Principles were drafted and is the authoritative version for reference.

A copy of The Guiding Principles on Internal Displacement in English can be found at: http://www.brookings.edu/fp/projects/idp/resources/GPsEnglish.pdf

The Principles were translated into Kurmanji Kurdish by Baran Rizgar (2007).

*Prensîpên Rêber li ser Jicîhûwarkirina Navxweyî*

---

**Pêşgotina Birêz Sergio Vieira de Mello**
**Cîhgirê Sekreterê Giştî ji bo Karûbarên Alîkarîya Mirovîn**

**Li Ser Prensîpên Rêber**

Civaka alîkarîya însanî (mirovîn) her ku diçe ji krîza jicîhûwarkirina navxweyî, ku li seranserî dinyê bandorê li bêtirî 20 milyon mirovan dike, bêtir haydar dibe. Her çiqas berpirsîya parastina mirovên jicîhûwarkirina navxweyî berî her kesî li hikûmetên netewî û desthilatîyên herêmî dikeve jî, girîng e ku civaka navnetewî  bibîne ku di rewşên nakokî û krîzan de dikane bi çi awayî herî baş tev li çêtirkirina parastina mirovên jicîhûwarkirina navxweyî bibe. Her weha, divê em alîkarîya mirovîn bi awakî wisa saz bikin ku ew parastina mirovên jicîhûwarkirina navxweyî piştxurt bike.

Di nav sîstema Netewên Yekbûyî (NY) de, ji bo bi bandor û di demê de bersîvkirina pêwîstîyên mirovên jicîhûwarkirina navxweyî gavên girîng hatine avêtin. Komîteya Mayînde ya Nav Sazîyan (IASC) berpirsî daye min ku ez di nav Sîstema NY de ji bo mijarên têkildarî mirovên jicîhûwarkirina navxweyî, wek Niqteya Navendî tev bigerim. Di bicîhanîna vê berpirsiyarîyê de, ez li xwe digirim ku kapasîteya Netewên Yekbûyî a bersîvkirina rewşên jicîhûwarkirina navxweyî bi giştî zêde bikim û her weha koordînasyona xurt, bêtir bi zelalî parkirina berpirsîyên sazîyan û piştevanîya têrkir ji bo sazîyên xebatê pêşde bixim.

Di vê çarçovê de, ez bi kêfxweşî pêşwazî dikim ku Prensîpên Rêber ên Jicîhûwarkirina Navxweyî ji alîyê Nûnerê Taybetî yê Sekreterê Giştî yê ji bo mirovên jicîhûwarkirina navxweyî ve tên weşandin. Ev Prensîpên ku li ser hîmê qanûna alîkarîya mirovîn û pêwengên mafên mirovan hatine pêkanîn dê di pêşkêşkirina alîkarî û parastina mirovên jicîhûwarkirina navxweyî de wek standardeke navnetewî xizmetê bikin, ku li gel hikûmetan, ji bo sazîyên navnetewî yên alîkarîya mirovîn û avadanîyê jî rêberîyê bikin.

IASC (Komîteya Daîmî ya Nav Sazîyan) bi giştî piştevanîya Prensîpên Rêberîyê dike û endamên xwe teşwîk kiriye ku wan bi Desteyên Birêvebir û karmendên xwe, bi taybetî ewên di nav vê xebatê de bidin nasandin, da ku Prensîpan di nav çalakîyên xwe yên li ser navê mirovên jicîhûwarkirina navxweyî de bicîh bînin.

Ez bawer dikim ku Prensîpên Rêber dikanin roleke girîng bilîzin, da ku bêtir hay ji pêwîstîyên mirovên jicîhûwarkirina navxweyî hebe, civaka alîkarîya mirovîn ji bo piştevanîyê seferber bibe û alîkarîya hevalên li qada xebatê bikin ku dema ku bi parastin û alîkarîya pêwîstîyên mirovên jicîhûwarkirî re rûbirû dibin, çareserîyan bibînin. Prensîp ê her weha ji bo pêşkêşkirina ewlekarî û xweşhalîya mirovên xwe yên ji cîhûwarkirî ji hikûmetan re jî bibin alîkar.

Ez hêvî dikim ku her yek ji we dê ji bo herî berfireh belavkirin û bicîhanîna Prensîpên Rêber xebatê bikin, da ku di statu û mijûlbûna bi mirovên jicîhûwarkirina navxweyî de, çêtirkirina ku pir pêwîstî pê heye bidest bixin.

**Pêşgotina Birêz Francis M. Dengê Nûnerê Sekreterê Giştî**
**Li Ser Mirovên Jicîhûwarkirina Navxweyî**

Civaka navnetewî bi karekî yekcar girs rûbirû dibe, ku ji bo mirovên ku ji ber nakokîyên bi tundûtûjî, binpêkirinên çors ên mafên mirovan û bûyerên din ên hejandêr (trawmatîk) bi darê zorê ji cîhûwarên xwe dibin, lê belê di nav sînorên welatên xwe de dimînin, parastinê misoger bike. Hema hema her tim mehrûmbûn, dijwarî û cîhêkarî bi sere wan de tê. Prensîpên Rêberîyê yên Jicîhûwarkirina Navxweyî ji bo bersîvkirina vî karê dijwar hatine pêşdexistin.

Prensîp, maf û garantîyên têkildarî parastina jicîhûwarkirîyên navxweyî di hemû pêngavên jicîhûwarkirinê de didin nasandin. Ew li dijî jicîhûwarkirina keyfî parastinê pêşkêş dikin, di dema ji cîhûwarkirinê de bingeheke parastin û alîkarîyê pêşniyar dikin, û ji bo vegera ewle, ji nuh de bicîhbûn û ji nuh de întegrasyonê, garantîyan saz dikin. Her çiqas ew awayekî girêdanê pêk nahînin jî, ev prensîp nûvedana mafên mirovan ên navnetewî, qanûna alîkarîya mirovîn û analogên qanûna penaberan dikin û bi wan re di ahengê de ne.

Prensîp, di nav çend salên piştî desthilatîya ku Komîsyona Mafên Mirovan di 1992an de da min hatin pêşdixistin û dûre bi biryarên Komîsyonê û Civîna Giştî hatin piştxurtkirin. Berê ji min hat xwestin ku ez sedem û encamên jicîhûwarkirina navxweyî, statuya jicîhûwarkirîyên navxweyî di qanûna navnetewî de, ku amadekarîyên sazîyan ên nuha bi çi berfirehîyê pêwîstîyên wan bersîv dikin û awayên çêtirkirina parastin û alîkarîya wan, lêkolîn bikim.

Li gora vê yekê, ji bo jicîhûwarkirîyên navxweyî pêşdexistina çarçoveyên pêwîst ên hiqûqî û yên sazîyan û ji bo pêkanîna dîyalogeke di navbera Hikûmetan û yên din de, li ser navê wan lixwegirtina mîsyonên welatan bûne çalakîyên sereke yên desthilatîya min. Bi hevkarîya tîmeke pisporên hiqûqa navnetewî, min lêkolîn kir ku qanûna navnetewî bi çi berfirehîya têrkir bi mirovên jicîhûwarkirina navxweyî mijûl dibe û min “Berhevdan û Analîzeke Normên Hiqûqî” (E/CN.4/1996/52/Add.2) pêk anî. Lêkolînê xuya kir ku her çiqas qanûna heyî bi firehî bi mirovên jicîhûwarkirina navxweyî mijûl dibe jî, ji bo parastin û alîkarîya wan bingeheke têrkir pêşkêş nake. Piştî wê, Komîsyon û Civîna giştî daxwaz kir ku ez ji bo jicîhûwarkirîyên navxweyî çarçoveyeke qaydegir a minasib amade bikim. Vê yekê rê li amadekirina reşnivîsa Prensîpên Rêber vekir, ku hem normên heyî ji nuh de îfade dikin û hem jî hewl didin ku cîhên şêlî zelal bikin û valahîyan tije bikin.

Piştî ku min di 1988an de Prensîpên Rêber pêşkêşî Komîsyonê kirin, Komîsyonê biryarek sitend û tê de bal kişand ser Prensîpên Rêber û wek Nûnerê Sekreterê Giştî, nîyeta min a bikaranîna wan di dîyalogên domdar ên bi Hikûmetan re û her wisa hemû kesên ku desthilatî û çalakîyên wan têkildarî pêwîstîyên jicîhûwarkirîyên navxweyî ne. Komîsyonê her weha bal kişand ser Komîteya Mayînde ya Nav Sazîyan, ku bi Prensîpan kêfxweş bûbûn û endamên xwe teşwîk kiribûn ku li ser wan agahîyê bidin Desteyên Birêvebir û karmendên xwe, bi taybetî di nav vê xebatê de, û wan di nav çalakîyên xwe yên li ser navê jicîhûwarkirîyên navxweyî de bicîh bînin.

Divê Prensîpên Rêber di karûbarên li ser mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî de, rêberîya binirx a pratîkî pêşkêşî Hikûmetan, desthilatîyên din ên ji bo kar minasib, sazîyên nav hikûmetan û sazîyên nehikûmetî (NGO) bikin. Hêvîya min ew e ku ew ê bi firehî bên belavkirin û li herêma xebatê di pratîkê de bên bicîhanîn.

# PRENSÎPÊN RÊBER ÊN JICÎHÛWARKIRINA NAVXWEYÎ

---

### Pêşgotin - Berfirehî û Armanc

1. Ev Prensîpên Rêber li ser pêwîstîyên taybetî yên jicîhûwarkirîyên navxweyî yên seranserî dinyê radiwestin. Ew têkildarî parastina mirovên di nav welêt de bi darê zorê jicîhûwarkirî û parastin û alîkarîya wan a di dema jicîhûwarkirinê û dema veger û ji nuh de bicîhbûn û ji nuh de întegrasyonê de, maf û garantîyan didin nasandin.

2. Ji bo armancên van Prensîpan, mirovên jicîhûwarkirîyên navxweyî ew kes an komên kesan in ku bi darê zorê an jî hatine mecbûrkirin ku birevin an jî terka mal an cîhên xwe bikin, da ku ji bandorên nakokîya çekdar, rewşên tundûtûjîya gelemperî, binpêkirinên mafên mirovan an jî karesatên xweristî yên ji alîyê mirovan pêkhatî, bi dûr bikevin, û ku sînorekî Dewleteke di nav netewan de naskirî derbas nekirine.

3. Ev prensîp, nûvedana qanûna mafên mirovan ên navnetewî û qanûna alîkarîya mirovîn a navnetewî ne û bi wan re di ahengê de ne. Ew ji bo evên jêrîn rêberîyê pêşkêş dikin:

(a) Nûnerê Sekteterê Giştî yê mirovên jicîhûwarkirina navxweyî, dema ku desthilatîya xwe bicîh dihîne;
(b) Dewletên ku bi dîyardeya jicîhûwarkirina navxweyî re rûbirû dibin;
(c) Ji bo têkilîyên hemû desthilatî, kom û kesên din bi mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî re; û
(d) Sazîyên nav hikûmetan û yên nehikûmetî, dema ku bi jicîhûwarkirina navxweyî mijûl dibin.

4. Ev Prensîpên Rêber divê heta ku dibe bi firehî bên belavkirin û bicîhanîn.

### Beş I. Prensîpên Gelemperî

### *Prensîp 1*

1. Divê heman maf û azadîyên ku mirovên din ên li welatê wan li gora qanûna navnetewî û ya navxweyî hene, ji bo mirovên jicîhûwarkirina navxweyî jî bi wekhevîya giştî hebin. Divê ji ber ku di nav welêt de hatine jicîhûwarkirin, di bikaranîna tu maf û azadîyan de li dijî wan tu cîhêkarî neyê kirin.

2. Ev Prensîp, li gora qanûna navnetewî tu bandorê li berpirsîya krîmînal a kesan nake; bi taybetî yên ku têkildarî qirkirinê, sûcên li dijî mirovatîyê û sûcên şer in.

### *Prensîp 2*

1. Statuya wan a hiqûqî çi dibe bila be, dê hemû desthilatî, kom û kes li gora Van Prensîpan tev bigerin û bêyî cîhêhiştineke dijber wan bicîh bînin. Li gora Van Prensîpan tevgerîn dê bandorê li statuya hiqûqî ya tu desthilatî, kom an kesên têkildar neke.

2. Ev Prensîp ê ji bo bisînorkirin, guherandin an kêmkirina pêşkêşkirinên tu mafên mirovan ên navnetewî yan pêwenga qanûna alîkarîya mirovîn a navnetewî yan jî mafên ku li gora qanûna navxweyî ji mirovan re hatine dayin, neyên şîrovekirin. Ev Prensîp tu bandorê bi taybetî li mafê li welatên din dozkirin û bidestxistina penaberîyê nakin.

### *Prensîp 3*

1. Desthilatîyên netewî erk û berpirsîya sereke heye ku parastin û alîkarîya mirovîn bo mirovên jicîhûwarkirîyên navxweyî yên di nav desthilatîya xwe de pêşkêş bikin.

2. Mirovên jicîhûwarkirina navxweyî mafê xwe hene ku ji van desthilatîyan parastinê û alîkarîya mirovîn doz bikin. Ew ê ji bo dozkirineke wisa neyên çewisandin an cezakirin.

### *Prensîp 4*

1. Divê ev Prensîp wisa bên bicîhkirin ku cudagirtineke bi awayê nijad, reng, cins, ziman, ol (dîn) an bawerî, nêrîna sîyasî yan wekî din, eslê netewî, etnîkî an civakî, statuya hiqûqî an civakî, jî (temen), kêmendamî (seqetî), mal û milk, zayin an wekî din pîvaneke bi vî rengî, pêk neyê.

2. Hinek mirovên jicîhûwarkirina navxweyî yên wek zarok, bi taybetî piçûkên bi serê xwe, dayikên ducan, dayikên bi zarokên piçûk, malxoyên malbatan ên jin, kesên kêmendam (seqet) û kal û pîr dê mafê parastin û alîkarîya ku rewşa wan pêwîst dike û pêmijûbûna ku pêwîstîyên wan ên taybetî li pêş çav digire, bidest bixin.

## Beş II. Prensîpên Pêşîlêgirtina Jicîhûwarbûnê

### *Prensîp 5*

Hemû desthilatî û aktorên navnetewî dê rêzgirtina erk û berpirsîyên xwe yên li gora qanûna navnetewî bikin, ku qanûna mafên mirovan û alîkarîya mirovîn di nav de ye, û di hemû rewşan de rêzgirtina wan misoger bikin, da ku pêşî li şerd û mercên ku dibe ku rê li ber jicîhûwarbûna mirovan vekin, bigirin û nehêlin ku ew pêk werin.

### *Prensîp 6*

1. Her mirovek ê li hemberî keyfî derxistina ji mala xwe an ji cîhûwarê xwe yê ji bav û kalan mayî mafê parastinê hebe.

2. Qedexekirina jicîhûwarkirina keyfî van awayên jicîhûwarkirinê dihundirîne:

(a) Dema ku ew li ser hîmê sîyasetên nijadperestî, “paqijîya etnîkî” an kirinên wek wan be, ku guherandina kompozîsyona etnîkî, olî an nijadî ya gelê bandorlêbûyî armanc bike an jî wê encamê bide;
(b) Di rewşên nakokîya çekdar de, heke ewlekarîya sîvîlên têkildar an jî sedemên leşkerî yên mecbûrî wisa pêwîst neke;
(c) Di rewşên projeyên avadanîya berfireh de, ku ne ji ber berjewendîyên gelêrî yên mecbûrî û nirx-girantir be;
(d) Di rewşên karesatan de, heke ewlekarî û tendurustîya kesên bandorlêbûyî ji cîh derxistina wan pêwîst neke; û
(e) Dema ku ew wek cezakirineke komelî tê bikaranîn.

3. Dema jicîhûwarbûnê dê ji pêwîstîya şerd û mercan ne bêtir be.

### *Prensîp 7*

1. Berî her biryareke ku jicîhûwarkirina mirovan pêwîst bike, desthilatîyên têkildar ê bicîh bikin ku li hemû alternatîvên mumkun hatiye nêrîn, da ku jicîhûwarkirin pêk neyê. Li cîhê ku qet alternatîv tunebin, ji bo kêmtirîn kirina jicîhûwarkirinê û bandora wê ya neyînî, hemû tedbîr ê bên sitendin.

2. Desthilatîyên ku jicîhûwarkirineke wisa pêk tînin ê bicîh bikin ku, heta ku ji alîyê pratîkî ve mumkun be, cîhê minasib ji mirovên jicîhûwarkirî re bê pêşkêşkirin, ku derxistina ji cîh û war di şerd û mercên têrkir ên ewlekarî, xurekî (xwarin), tendurustî û hîjyenê de pêk bê, û ku endamên heman malbatê ji hev neyên veqetandin.

3. Heke jicîhûwarkirin di şerd û mercên ji bilî dema gehînekên rewşa acil a nakokîyên çekdar û karesatan biqewime, garantîyên jêrîn ê bên bicîhanîn:

(a) Biryareke taybetî ya desthilatîyeke Dewletekê ku qanûn wê desthilatîyê didê ku tedbîrên wisa pêk bîne;
(b) Tevdirên têrkir tên sitendin ku ji kesên ku tên jicîhûwarkirin re li ser sedem û prosedurên ji bo jicîhûwarkirina wan bi giştî agahî û li cîhê ku dibe, agahîya li ser qerebû (tezmînat) û ji nuh ve bicîhkirinê bê dayin;
(c) Divê mirovên ku tên jicîhûwarkirin pêşî bên agahdar kirin û di rewşeke azad de razîbûna wan bê xwestin;
(d) Desthilatîyên têkildar ê hewl bidin ku kesên bandor lê bûyî, bi taybetî jinan, tev li plankirin û birêvebirîya ji nuh de bicîhkirina wan bike;
(e) Tedbîrên bicîhanîna qanûnê, li cîhê pêwîst, dê ji alîyê desthilatîyên hiqûqî yên şareza ve bên pêkanîn; û
(f) Dê rêz li mafê çareserîyeke bi bandor bê girtin, ji alîyên desthilatîyên hiqûqî ve dîsa pêşçavkirina biryarên weha jî di nav de.

### *Prensîp 8*

Divê jicîhûwarkirin weha neyê birêvebirin ku mafên jîyan, serbilindî û ewlehîya mirovên ku bandor lê dibe binpê bike.

### *Prensîp 9*

Berpirsîyeke taybet a dewletan heye ku gelên xwecîh, hindikahî, gundî, bejahîvan û koçer û komên din ku bi awayekî taybet bi erdên xwe ve girêdayî ne û muhtacî wan in, ji bêcîhûwarkirinê biparêzin.

## Beş III. Prensîpên li ser parastina di dema jicîhûwarkirinê de

### *Prensîp 10*

1. Her mirovek ji zayinê ve xwedî mafê jîyanê ye ku divê ji alîyê qanûnê ve bê parastin. Kesek ê bi awayekî keyfî ji jîyana xwe mehrûm nebe. Mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî dê bi taybetî li hemberî evên jêrîn bên parastin:

(a) Qirkirin (jenosîd);
(b) Kuştin;
(c) Înfazên bê darizandin an keyfî; û
(d) Bi darê zorê birin û wendakirina mirovan, revandin an binçavkirina nehênî, bi mirinê gef xwarin (tehdît kirin) an bi mirinê bi dawî bûn jî di nav de.

Gefxwarin û gijkirina (lê sor kirin) pêkanîna yek ji kirinên jorgotî dê bê qedexekirin.

2. Êrîş an jî kirinên din ên tundûtûjîyê li dijî mirovên jicîhûwarkirina navxweyî ku tev li pevketin û dijminatîyan nabin, an jî hew tev lê dibin, di hemû rewşan de qedexe ye. Mirovên di nav welêt de ji cîhûwarkirî dê bi taybetî li hemberî evên jêrîn bên parastin:

(a) Êrîşên yekser an korfelaqî (bêyî cuda girtin) an jî kirinên din ên tundûtûjîyê, pêkanîna herêmên ku rê li ber erîşên li ser sîvîlan vedikin jî di nav de;
(b) Wek awayekî şer, birçî hiştin;
(c) Bikaranîna wan li hemberî êrîşan wek mertala armancên leşkerî, an jî mertalkirin, piştxurtkirin an astengkirina operasyonên leşkerî;
(d) Êrîşên li ser kamp an derûdorên lê bicîhkirî; û
(e) Bikaranîna mayinên erdê yên dijî mirovan.

### *Prensîp 11*

1. Her mirovek xwedî mafê serbilindî û bêkêmasîbûna fîzîkî, hişmendî û exlaqî ye.

2. Mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî, azadîya tevgera wan hatibe an nehatibe sînorkirin jî, dê li hemberî yên jêrîn bên parastin:

(a) Destavêtin (tecawiz), jêkirina endamên laş, êşkence, pêmijûlbûn an cezakirina zordar, nemirovîn an heqaretî, û rezaletên din ên li dijî serbilindîya kesanî, wek kirinên tundûtûjîya bi taybetî li dijî cinsekê, bi zorê fahîşetî (orospîtî) kirin û her tewre êrîşa neexlaqî;
(b) Koledarî an her awayekî nûjen ê koledarîyê, wek ji bo zewacê firotin, şêlandina cinsî, an jî bi zorê xebitandina zarokan; û
(c) Bi armanca terorkirina mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî, kirinên tundûtûjîyê.

Gefxwarin û gijkirina her kirineke li jor gotî dê bê qedexekirin

***Prensîp 12***

1. Mafê her mirovî yê azadî û ewlehîya kesanî heye. Kesek ê bi awayekî keyfî neyê girtin an binçavkirin.

2. Ji bo ku mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî bikanibin vî mafî bicîh bînin, divê ew li kampekê neyên komkirin û bisînorkirin. Heke di rewşên awarte de komkirin an bisînorkirineke bi vî awayî bi misogerî pêwîst be, ew ê ji qasî ku şerd û merc pêwîst dikin dirêjtir najo.

3. Mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî dê ji girtin û binçavkirina korfelaqî ya wek encameke jicîhûwarkirina wan, bên parastin.

4. Mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî dê bi tu awayî neyên rehînkirin.

***Prensîp 13***

1. Zarokên jicîhûwarkirî dê tu caran di nav dijminatîyan de neyên bikaranîn, ne jî ji bo wê zor li wan bê dayin an destûra tevlêbûna wan bê dayin.

2. Mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî dê bên parastin, da ku wek encameke ji cîhûwarkirina wan, hêz an komên çekdar nikanibin wan bê rêz û qayde têxin nav refên xwe. Bi taybetî hemû kirinên zordar, ne mirovîn an heqaretî ku ferz dikin ku bibin endam, an jî ji bo nebûna endametîyê cezayê bixwin, di hemû şerd û mercan de qedexe ne.

***Prensîp 14***

1. Her mirovekî di nav welêt de jicîhûwarkirî mafê serbestîya tevgerînê û azadîya hilbijartina cîhê lêmayinê heye.

2. Bi taybetî, mafê mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî heye ku di ketin û derketina ji kampan an jî derên din ên lê bicîhkirî de, serbest bin.

### *Pensîp 15*

Mirovên di nav welêt de jicîhûwakirî ev maf hene:

(a) Mafê lêgerîna ewlehîyê li beşeke din a welêt;
(b) Mafê ji welatê xwe derketinê;
(c) Mafê li welatekî din doza penaberîyê kirinê; û
(d) Mafê parastina li hemberî veger an bicîhkirina bi zorê li dereke ku jîyan, ewlekarî, serbestî û/an tendurustîya wan di xeterê de be.

### *Prensîp 16*

1. Mafê hemû mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî heye ku bizanibin ku çi bi serê merivên wan ên wendabûyî de hatiye û li kuderê ne.

2. Desthilatîyên têkildar ê hewl bidin ku cîhên mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî, ku wek wendabûyî hatine raporkirin, hîn bibin, û bi sazîyên navnetewî yên bi vî karî têkildar re hevkarîyê bikin. Ew ê merivên wan ên herî nêzîk ji pêşketina lêpirsînê haydar û ji hemû encaman agahdar bikin.

3. Desthilatîyên têkildar ê hewl bidin ku bermayên mirîyan kom bikin, nasnameya wan zelal bikin, nehêlin ku bên talankirin an xera bibin, û vegera wan bermayan li merivê wan ê herî nêzîk, an jî bi rûmet û rêzgirtin veşartina wan saz bikin.

4. Divê cîhên gorên mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî di hemû şerd û mercan de bên parastin û rêzgirtin. Mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî divê mafê ketina nav cîhên gorên merivên xwe yên mirî hebin.

### *Prensîp 17*

1. Her mirov mafê xwe heye ku rêz li jîyana malbata wî/wê bê girtin.

2. Ji bo ku mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî bikanibin vî mafî bikar bînin, endamên malbatê yên ku dixwazin pev re bimînin, dê destûr hebin ku weha bikin.

3. Malbatên ku bi jicîhûwarkirinê ji hev veqetîyane divê heta ku dibe zû li hev bên vegerandin. Hemû gavên minasib ê bên avêtin ku dîsa pevrebûna malbatên weha bê lezandin, bi taybetî jî dema ku zarok hebin. Desthilatîyên berpirs ê ji bo lêpirsînên endamên malbatan dam û dezgehan saz bikin û di karê dîsa hevgîhandina malbatê de hevkarîya karê sazîyên alîkarîya mirovîn bikin.

4. Malbatên mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî ku serbestîya wan a kesanî bi binçavkirin an bisînorkirina li kampan hatiye bisînorkirin ê mafê pevremayinê hebin.

### *Prensîp 18*

1. Hemû mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî mafê jîyana bi standardeke têrkir heye.

2. Şerd û merc çi dibin bila bin, desthilatîyên rayedar ê bêyî cîhêkarî û cudagirtin bicîh bikin ku jicîhûwarkirîyên navxweyî bi ewlehî xwe bigihînin evên jêrîn:

(a) Xwarina zerûrî û ava vexwarinê;
(b) Sitargeh û xanîyên bingehîn;
(c) Cil û bergên minasib; û
(d) Xizmetên sereke yên tibbî û yên paqijîyê.

3. Divê ji bo bi giştî tevlêbûna jinan bo plansazî û belavkirina van îmkanên sereke, hewldanên taybetî bên kirin.

### *Prensîp 19*

1. Ji mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî hemû kesên nexweş û birîndar, her weha ewên kêmendam (seqet) dê heta ku bi pratîkî mimkun be, fireh û bi derengîya herî kêm lênêrîn û baldarîya tibbî ya ji bo wan pêwîst bisitînin û ji bilî sedemên tibbî cuda neyên girtin. Dema ku pêwîst be, mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî dê bikanibin xizmetên psîkolojîk û civakî bikar bînin.

2. Divê ji bo pêwîstîyên tendurustîya jinan bi taybetî baldarbûn hebe, ku xwegîhandina pêşkêşvan û xizmetên lênêrîna tendurustîya jinan, wek lênêrîna tendurustîya zayinê, her weha şêwirdarîya minasib ji bo qurbanîyên xerabkarîya cinsî û yên din di nav de bin.

3. Divê her weha baldarîya taybet ji bo pêşîlêgirtina nexweşîyên têger û bi înfeksîyon di nav mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî de hebe, ku AIDS jî di nav de be.

### *Prensîp 20*

1. Her mirovek xwedîmaf e ku li her derê li pêş qanûnê wek kesekî bê naskirin.

2. Ji bo ku mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî bikanibin vî mafî bikar bînin, desthilatîyên têkildar ê hemû dokumentên ji bo bikaranîna mafên wan ên hiqûqî pêwîst, wek pasaport, dokumentên nasnameyên kesanî, sertîfîkayên zayinê û sertîfîkayên zewacê, bidin wan. Desthilatî yê bi taybetî dayina dokumentên nuh an jî nuhkirina dokumentên ku di dema jicîhûwarkirinê de wenda bûne, bi şerd û mercên ne maqûl girê nede; wek mînak ji bo bidestxistina van dokumentan an jî dokumentên din, vegera cîhûwarê berê pêwîst nekin.

3. Divê mafên jin û zilaman ên bidestxistina dokumentên weha pêwîst wekhev bin û mafê wan hebe ku dokumentên weha li ser navên wan bên dayin.

### *Prensîp 21*

1. Divê kesek bi awayekî keyfî ji milk û malên xwe bêpar neyê hiştin.

2. Milk û malên mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî dê di hemû rewşan de bên parastin, bi taybetî li hemberî kirinên jêrîn:

(a) Talan;
(b) Êrîşên yekser an korfelaqî, an jî kirinên din ên tundûtûjîyê;
(c) Ji bo operasyon an armancên leşkerî wek mertal bikaranîn;
(d) Bikin armanca bersîvdayinê; û
(e) Wek awayekî cezakirina komelî rûxandin an desteser kirin.

3. Milk û malên ku mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî li dû xwe hiştine, divê ji rûxandin û desteserkirina keyfî û ne hiqûqî, tê de rûniştin an bikaranînê bên parastin.

### *Prensîp 22*

1. Mirovên jicîhûwarkirina navxweyî, çi li kampan dimînin çi jî namînin, dê di bikaranîna mafên jêrîn de wek encameke jicîhûwarkirina wan, nebin mijara cîhêkarî an cudagirtinê:

(a) Mafên azadîya ramanê, wîcdan, ol an bawerîyê, nêrîn û îfadekirina ramanê;
(b) Mafê bi serbestî li derfetên kar gerînê û tevlêbûna çalakîyên ekonomîk;
(c) Mafê bi serbestî têkil bûn û tevlêbûna wekhev a karûbarên civakî;
(d) Mafê dengdayinê û tevlêbûna karûbarên hikûmetê û yên gelêrî, mafê xwegîhandina pêwengên ji bo bikaranîna vî mafî pêwîst jî di nav de ye; û
(e) Mafê komunîkasyona bi zimanekî ku têdigihêjin.

### *Prensîp 23*

1. Mafê her mirovî yê perwerdebûnê heye.

2. Ji bo ku mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî bikanibin vî mafî bikar bînin, desthilatîyên têkildar ê bicîh bikin ku kesên wisa û bi taybetî jî zarokên jicîhûwarkirî, perwerdeya bêpere û di asta sereke de mecbûrî, bidest bixin. Divê perwerde rêzê li nasnameya wan a çandî, zimanê wan û ola wan bigire.

3. Divê hewldanên taybetî bên kirin ku jin û keç bi giştî û wekhevî tev li bernameyên perwerdeyî bibin.

4. Çer ku şerd û merc misaît bibin, ji bo mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî, dê îmkanên perwerde û perwerdeya kar bên peydekirin; bi taybetî ji bo ciwan û jinan, çi li kampan dimînin çi namînin.

**Beş IV. Prensîpên Têkildarî Alîkarîya Mirovîn**

### *Prensîp 24*

1. Hemû alîkarîya mirovîn ê li gora prensîpên mirovatîyê û alî negirtinê û bê cîhêkarî bên birêvebirin

2. Alîkarîya mirovîn a ji bo mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî dê ji dereke din re neyê şandin, bi taybetî ji ber sedemên sîyasî an leşkerî.

### *Prensîp 25*

1. Erk û berpirsîya sereke ji bo pêşkêşkirina alîkarîya mirovîn bo mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî li deshilatîyên netewî dikeve.

2. Sazîyên alîkarîya mirovîn ên navnetewî û aktorên din ên minasib mafê xwe hene ku ji bo piştevanîya jicîhûwarkirîyên navxweyî xizmetên xwe pêşniyar bikin. Pêşniyareke wisa dê wek kirineke ne dostane an jî destêwerdana karûbarên navxweyî yên Dewletê neyê dîtin û dê wek bi mebesta pak lê bê nêrîn. Ji bo vê yekê razîbûn ê bi keyfî neyê ragirtin, bi taybetî jî dema ku desthilatîyên têkildar nikanibin an nexwazin alîkarîya mirovîn a pêwîst pêşkêş bikin.

3. Hemû desthilatîyên têkildar ê bihêlin û îmkanan bidin ku alîkarîya mirovîn derbas bibe û bi lez û bê sînorkirin rê bide kesên bi pêşkêşkirina vê alîkarîyê têkildar ku xwe bigihînin jicîhûwarkirîyên navxweyî.

### *Prensîp 26*

Mirovên bi alîkarîya mirovîn, veguhastin û pêşkêşkirina wan têkildar ê rêz lê bê girtin û bên parastin. Ew ê nebin armanca êrîşê an jî kirinên din ên tundûtûjîyê.

### *Prensîp 27*

1. International humanitarian organizations and other appropriate actors when providing assistance should give due regard to the protection needs and human rights of internally displaced persons and take appropriate measures in this regard. In so doing, these organizations and actors should respect relevant international standards and codes of conduct.

1. Sazîyên alîkarîya mirovîn ên navnetewî û aktorên din ên minasib, divê di dema pêşkirina alîkarîyê de rêzê li pêwîstîyên parastinê û mafên mirovan ên mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî bigirin û ji bo wê tedbîrên minasib bistînin. Di kirina vê yekê de, divê ev sazî û aktor rêzê li standard û pîvanên şêlan ên navnetewî ên pê têkildar bigirin.

2. Paragrafa berî vê, bandorê li berpirsîyên parastinê yên sazîyên navnetewî ku ji bo vê armancê desthilatîya wan heye û xizmetên wan dibe ku ji alîyê Dewletê ve bên pêşniyar kirin an jî dozkirin, nake.

### Beş V. Prensîpên ji bo veger, ji nuh de bicîhbûn û ji nuh de întegrasyonê

## *Prensîp 28*

1. Desthilatîyên rayedar erk û berpirsîya sereke hene ku şerd û mercan pêk bînin û her weha îmkanan pêşkêş bikin ku mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî bikanibin bi dilxwazî, di ewlehîyê de û bi serbilindî vegerin mal an cîhûwarên xwe, an jî bi dilxwazî li beşeke din a welêt bicîh bibin. Divê desthilatîyên wisa hewl bidin ku ji bo mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî yên vegerîyayî yan ji nuh de bicîhbûyî îmkanên ji nuh de întegrasyonê pêşkêş bikin.

2. Divê bi taybetî hewl bê dayin ku mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî bi giştî tev li plansazî û birêvebirîya veger an ji nuh de bicîh bûn an jî ji nuh de întegrasyona xwe bibin.

## *Prensîp 29*

1. Mirovên di nav welêt de ji cîhûwarkirî yên ku vegerîyane mal an cîhûwarên xwe an jî ku li beşeke din a welêt bicîh bûne, divê wek encameke jicîhûwarbûnê, li dijî wan cîhêkarî çênebe. Dê mafê wan hebe ku bi giştî û bi wekhevî di hemû astan de tev li karûbarên gelêrî bibin û xizmetên gelêrî bi wekhevî bikar bînin.

2. Desthilatîyên rayedar erk û berpirsî hene ku alîkarîya mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî yên vegerîyayî û/an ji nuh de bicîh bûyî bikin ku heta ku mumkun be, milk û malên xwe yên ku li dû xwe hiştine an jî di jicîhûwarkirinê de ji wan hatine sitendin, bi şûn ve bisitînin. Dema ku şûnve sitendina milk û malên wisa ne mumkun be, desthilatîyên rayedar ê bi xwe pêşkêş bikin an jî alîkarîya wan bikin ku qerebûya (tezmînat) minasib an awayekî din ê tamîrkirina adil bidest bixin.

## *Prensîp 30*

Hemû desthilatîyên têkildar ê bihêlin û îmkanan bidin ku sazîyên alîkarîya mirovîn ên navnetewî û aktorên din ên minasib desthilatîyên xwe yên têkildar bicîh bînin, zû û bêsînorkirin xwe bigihînin mirovên di nav welêt de jicîhûwarkirî ku alîkarîya veger an ji nuh de bicîhbûn an ji nuh de întegrasyona wan bikin.